

Rekorên Kurdan di Guinnessê da..

Ne ji dîyarîyên xwezayî bin, cîhê me di pirtûka rekoran a Guinnessê da wê tinebe.



Yek ji van Zaro Axayê Motkîyî ye. (Bedlîs) (1774-1931) Ew 157-160 sal jîya ye û wek merivê herî jîdirêj di Guinnessê da cî girtîye. Karkerî û paletîyê kirîye û li Stenbolê mirîye. 13 car zewicîye. 36 zar û neviyên wî hene. Li gorî Zaro Axayî, ew bi pîvaz, savar û dewî mezin bûye. Wî cixare nekişandîye, alkol û qehweyê venexwarîye. Di salên dawî yê jiyê xwe da çûye Îtalya, Îngilistan û USAyê. Li ser bedena wî lêkolîn hatine çêkirin; gelo çima ewqas dirêj jîyaye? Li gorî gotinan, Zaro Axayê ku 11 paşayên osmanî dîtine, dema ku dimire, neviçirçirikek wî dibêje: "Wax li min pepûkê! Kalikê min bi têra xwe jîyanê nedît!" Zaro Axayê esil Kurd ê ji bakûrê Kurdistanê, mixabin li ser navê "Tirkîyeyê" hildane pirtûka rekoran, çimkî temsîla Kurdistanê di cîhanê da, di nava miletan da tineye. (!)



Siltan Kosemê Kurd (2 mêtro 51 santîm) mirovê herî bejindirêj ê cîhanê ye. Siltan ji Dêrika Mêrdînê ye. Destê wî 27,5 cm., pêyê wî 36,5 cm. ye. Pêlavê wî 60 nimro ye. Ew jî bi vê rekorê di Guinnessê da ye û bi têra xwe li cîhanê digere, kêf kêfa wî ye. Navê Kosemî jî her wisa bi navê "Tirkîyeyê" di pirtûkê da ye.



Afşîn Qedirzade jî wek mirovê herî bejinkin ê cîhanê di Guinnessê da cîhê xwe girtiye. (65,34 cm.) Afşîn 20 salî û ji Rojhilatê Kurdistanê, ji gundê Bukanê ye. Giranîya Avşînê me jî, 6,5 kg. e. Avşîn dibêje; ew hez ji têlefona destî dike, lê têlefona ji bo wî hinek giran e. Avşîn jî bi navê Îranê di Guinnessê da ye.

Û her ev e halê me; mendelekirî, bi navê xelkê û belawela!

E. Ararat
23.12.2022